# Rêziknameya Reftara Exlaqî û Pîşeyî ya Çêkerên Naverokê

## "Paşkoya Rêziknameya Reftara Pîşeyî ya Medyayê"

### Yekem: Pêşgotin û Armanc:

Armanca vê paşkoyê, sazkirina çarçoveyeke pîşeyî û exlaqî ye ku rêzikên berhemanîna naverokê û rêzikên pêşkêşkirina wê diyar dike. Her wiha ji bo xurtkirina baweriyê di navbera çêker û cemawer de û pêşxistina berhemanîna naverokê ji bo bibandor, berpirsyar û avaker be.

### Duyem: Pênase:

1. **Naveroka Bilez Belavbûyî (Trend):**
   Mebest jê, her naveroka ku bilez belav dibe, di qadeke berfireh de tê parvekirin û di demeke kurt de dibe rojeva sereke ya axaftinan.
2. **Naveroka bi Mebesta Qazancê:**
   Ew naverok e ku armanca wê ya sereke û rasterast bidestxistina dahatê ye (wekî reklam, sponsorî, bazarkirina bi komîsyon, diyariyên di weşanên zindî de û hwd.).
3. **Naveroka Ziyanker:**
   Mebest jê, naveroka ku dibe sedema handana li ser gotara kîndariyê, zêdegavî, santaj, belavkirina agahiyên xapînok, keysebazî, binpêkirina taybetmendî û rûmeta kesan. Her wiha, biçûkxistina baweriyên olî, rîtuelan, devokên herêmî yan taybetmendiyên çandî yên koman jî di vê çarçoveyê de ne.
4. **Gotara Nefret/Kîndariyê:**
   Her naveroka devkî, dîtbarî an reftarî ye ku li ser bingeha

nasnameyê (ol, netewe, nijad, reng, herêm, zayend, ziman, kêmendamî, çînên civakî û hwd.) mirovan ber bi kînê, tundî, cudakarî an dûrxistinê ve han dide; yan jî rûmeta mirovan kêm dike û wan ji mirovahiyê derdixe.

5. **Zêdegaviya Dîjîtal:**
   Kiryareke bi zanebûn û qestî ye ku bi mebesta sivikayetî, navreşkirin, dûrxistin yan tinazkirina li dijî kesekî yan komeke mirovan tê kirin.

6. **Handan/Sorkirin:**
   Mebest jê, her kiryar an gotarek e ku tundiyê rewa nîşan dide, pesnê wê dide, yan jî bi awayekî rasterast an ne-rasterast banga tundiyê dike.

7. **Naveroka Xêrxwazî/Mirovî:**
   Ew naverok e ku doz û pirsgirêkên mirovî dide naskirin; armanca wê xurtkirina hestên hevpar, hişyarkirina raya giştî yan komkirina alîkariyan e.

**Sêyem: Prensîpên Giştî**

Çêkerên naverokê divê pabendî van prensîpên li jêr bibe:

1. Rûmeta mirovî di ser her tiştî re ye, weşandina her naverokek ku rûreşkirin, sivkayetî an rûmetşikandina mirovî di nav de hebe, qedexe ye.
2. Rastgoyî û Şefafiyet: Çêkerê naverokê pabend dibe ku naveroka reklamê bi zelalî destnîşan bike û wê bi awayekî fêmkirî û bêguman ji naverokên din cuda bike.

3. Weşandina her naverokekê ku bandoreke neyênî li ser komên lawaz dike; bi taybetî zarok, jin, kêmendam, qurbaniyên tundiyê, penaber û koçber, qedexe ye.
4. Nabe naverokên ku gotara kîndariyê dihewînin bên weşandin; her wiha nabe rê ji bo kesan bê dayîn ku handanê li dijî nefret, tolhildan, tundî û cudakariyê dikin, li ser platformên wan derkevin.
5. Nabe ku ji bo belavkirina agahiyên xapînok, handana bo kîndariyê yan spîkirina navê aliyên binpêker, ti fînanskirin an sponsorî werin qebûlkirin. Her wiha, karkirina bi komên ku tawanan plan dikin re qedexe ye.
6. Nîşandana komeke mirovî wekî "dijmin", daxistina asta rûmeta wan a mirovî, kêmkirina mafên wan, an jî damgarkirina komeke civakê bi tawanên ku ji aliyê kesan ve hatine kirin, qedexe ye.
7. Dûrketin ji gotara kîndariyê, cudakarî yan handana nerasterast a ku di bin navê qerfî, tinaz an henekên bêguneh de têne kirin.
8. Dûrketin ji pesndana tundiyê, bikaranîna madeyên hişber û destdirêjiyê û binpêkirina yasa û adetan, li hemberî reftarên ku zirarê digihînin civakê, nabe ti sistî were nîşandan.

## Çarem: Rûmeta Mirovî

### A) Rêzgirtina li Rûmeta Mirovî:

1. Li ser çêkerê naverokê qedexe ye ku peyvên rûreşker û kirêt bikar bîne, yan jî kesan di rewşên rûmetşikên de nîşan bide. Her wiha teqlîdkirina tevger an devokên xelkê bi mebesta tinazkirinê û ji bo zêdekirina danûstandinan, çi rasterast çi nerasterast qedexe ye.

2. Divê ji pêkanîna henekan an xapandinan ku li ser bingeha sivikayetî, tirsandin û gefxwarinê ne, were dûrketin. Nabe kesên din wekî tirsok, nezan an bêhiş werin nîşandan; her wiha nabe ti naverokek were berhemanîn ku bandoreke neyênî li ewlehiya derûnî û laşî ya mirovan bike. Wekî mînak:
    - **a)** Naverokên ku kesekî wekî tirsok, nezan, an ji aliyê derûnî û hişî ve hejiyayî nîşan didin.
    - **b)** Naverokên ku îşareta riwabûnê yan mijarên rûmetşikên dikin.
    - **c)** Naverokên ku tê de razên taybet an xalên lawaz ên mirovan ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin.
3. Hemû xalên li jêr, ji bo parvekirin an ji dubare weşandina naverokên trend jî derbasdar in. Parvekirina naverokên bi vî rengî tenê di çarçoveya nîşandana zirara wan an ji bo analîzkirina wan gengaz e; di vê rewşê de jî divê rû û deng werin şifrekişandin (blur), nasname û cihê bûyerê were veşartin, û bal ne li ser zêdekirina danûstandinê, lê belê li ser hişyarkirina civakê be.

**B) Rûmetşikandina Xwe:**

1. Ji çêkerên naverokê tê xwestin ku ji bo balkişandinê yan jî ji bo ku naveroka wan zêde were belavkirin (trend), xwe nexin rewşên rûmetşikên (wekî zirardanê bigihînin xwe, rûmeta xwe kêm bikin). Heke naverokeke ku tê de rûmeta mirov a li hemberî xwe tê binpêkirin were weşandin, divê were mîsogerkirin ku zarok û nûciwan wê nebînin; da ku ew nebe rêbazek ji bo bidestxistina dîtinan.

2. Handana cemawer bi awayekî rasterast an nerasterast ji bo ku kiryarên rûmetşikên li dijî xwe an kesên din bikin, qedexe ye.

**C) Rûmet di Ziman, Wêne û Çarçoveyê de:**

1. Divê ji wan henekên ku kesekî an komeke mirovan biçûk dixînin û rûmeta wan dişikînin, were dûrketin.
2. Bikaranîna şêweyên rûmetşikên ji bo laş, reng an rewşa derûnî ya mirovan qedexe ye.
3. Divê hejarî, nexweşî yan jî cilûberg nebin mijara tinazkirinê.
4. Di dema montajkirina vîdyo û dengan de, yan bikaranîna muzîk, deng an wêneyên ku hestê tinazkirin û rûreşkirinê li dijî kesekî yan komekê ava dikin, qedexe ye.
5. Nabe axaftin ji çarçoveya wê were derxistin, da ku ew kes wekî kesekî nezan, pûç, bêhiş an jî êrîşkar were nîşandan.

**T) Weşana Zindî, Danûstandina Yekser û Koment:**

1. Çêkerê naverokê di weşanên zindî de pabend dibe ku wan kesên ku bi rûmetşikandina xelkê yan belavkirina gotara kîndariyê têne naskirin, beşdarî weşana xwe neke. Her wiha, beşdarîkirina kesên ku peyvên kirêt bikar tînin an reftarên şermîn û neexlaqî dikin, qedexe ye.
2. Çêkerê naverokê pabend dibe ku di dema weşanê de, wan komentan nexwîne ku rûmetê dişikînin an jî hemû rêzikên li jor binpê dikin.

3. Divê Çêkerê naverokê destwerdanê bike, da ku pêlên zêdegaviyê, gotara kîndariyê yan rûmetşikandinê —çi di axaftinên rasterast de çi jî di beşa komentan de bin— bide sekinandin.
4. Çêkerê naverokê pabend dibe ku weşana zindî nexe platformekê ji bo belavkirina kîndariyê, şermezarkirina mirovan an şikandina rûmeta wan.
5. Pabend dibe ku heta pêkan e, beşa komentan birêve bibe; komentên wekî (gotara kîndariyê, gotegot, gef, zêdegavî, kilîşekirin û hwd.) jê bibe an rapor bike, da ku nebe sedema asayîkirina reftarên neyênî.
6. Çêkerê naverokê pabend dibe ku di danasîna profîla xwe de yan jî di postekî sînckirî de, ji bo nêrîn û komentan rêzikên zelal (her çend kurt bin jî) diyar bike. Divê ev rêzik gotara kîndariyê, rûreşkirin û kilîşekirinê qedexe bikin; di heman demê de handanê ji bo rêzgirtina li taybetmendiyan û rexneya avekar bikin.
7. Pabend dibe ku di weşana zindî yan di naverokên parvekirî de, mêvanên xwe, cemawer an beşek ji cemawer neke mijara zêdegaviyê, yan jî karên rûmetşikên bi wan bike, yan jiyana wan bixe metirsiyê.
8. Pabend dibe ku di rewşa binpêkirina Rêziknameyê û Paşkoya wê de, weşanê bide rawestandin, yan parve neke, yan jî naveroka parvekirî jê bibe.

**h) Weşandin û ji Dubare Weşandin:**

1- Gava ji bo weşandina naverokeke belgeyî ku dîmenên sivikatiyê yan êrişê tê de hene, berjewendiyeke giştî hebe, divê mirov li gorî van xalan tevbigere:

**a)** Zelalbûna berjewendiya giştî (wek: belgekirina binpêkirinan, aşkerekirina reftareke metirsîdar, xebata ji bo lêpirsînê, lêkolîn û hwd.).

**b)** Şifrekişandina ser nasnameya qurbaniyan (blur) bi awayekî ku naskirina wan di naveroka weşandî de dijwar be; di heman demê de parastina kopiyên resen tenê ji bo belgekirin û dadgehan.

- **c)** Divê dîmenên sivikatiyê dirêj neyên nîşandan; parvekirin divê tenê bi beşeke pir kurt a ku ji bo fêmkirina armancê bes e, were sînordarkirin.
- **d)** Divê şîroveyên ku rûmeta mirovan diparêzin û kiryarê bi awayekî aqilane şermezar dikin, li ser vîdyo an dengan bên zêdekirin.

2- Naverokên sivikatiyê nabe wekî destpêk (intro), dawî (outro) an ji bo qerf û henekan werin bikaranîn.

3- Çêkerê naverokê dikare mînakên li ser gotara kîndariyê yan çewsandinê nîşan bide, lê bi armanca rexnekirin, şîrovekirin û hişyarkirina raya giştî; bi şertê ku:

**a)** Her gav were tekezkirin ku ev kiryar ji aliyê exlaqî û yasayî ve nayê qebûlkirin.

**b)** Parçeya xerab wekî xwe neyê weşandin, da ku xerabî û azar careke din dubare nebe.

- **c)** Hemû nîşaneyên nasnameyê werin veşartin û tenê giranî bê dayîn ser reftarê bi xwe.

4- Berhemanîn an dubare berhemanîna her naverokeke trend an meydanxwazî yên ku handana bo tundûtûjî, nijadperestî, kilîşekirin, an tinazkirina bi komeke diyarkirî dikin, qedexe ye.

5- Naverokên li ser dozên taybet ên tawanan an yên li dijî urf, adet, nirx û sînorên olî yên civakê ne, nayên weşandin. Tenê eger di rewşên hişyarkirin û berjewendiya giştî de bin û piştî veşartina hemû agahî û nîşaneyan, dikare bi kurtebirî behsa wan bê kirin.

6- Çêkerê naverokê divê bizanibe ku dubare weşandina naverokên trend, berpirsiyariya wî zêdetir dike û dibe sedema belavbûna naveroka zerardar; lewma divê bi hişyarî û berpirsiyarî nêzî weşandina van bibe.

7- Çêkerê naverokê divê haydar be ku dubarekirina naveroka zerardar, dibe sedema tevlîheviya dîjîtal, bandoreke neyînî li naverokên cidî dike, baweriya xelkê lawaz dike û dibe sedema geşbûna rêbazên nepîşeyî.

8- Ew naverokên ku jiyana mirovan dixe metirsiyê (wekî meydanxwaziyên xeternak, henekên tûj û tund, an mînakên ku yasa û nirxên civakî û olî binpê dikin) nayên weşandin; da ku kiryarên neyasayî û xeternak nebin tiştên asayî.

9- Heke çêkerê naverokê bixwaze naverokeke xeternak dubare berhem bîne û biweşîne, divê beşa xeternak jê bibe û çalakiyeke ewle bixe şûna wê. Her wiha divê dîmenên pir kurt bikar bîne, nîşaneyan veşêre û wê meydanxwaziyê veguherîne çalakiyeke perwerdehiyê; bi vî awayî xetereyê bi belgeyan nîşan bide û şopîneran han bide ku tevlî nebin.

10- Çêkerê naverokê nabe tiştên ku hestên mirovan birîndar dikin parve bike. Her wiha, nabe naverokên bênirx bi navê "hişyariyê" nîşan bide, dema ku armanca wan a veşartî, handana bo heman kiryara neyînî be.

**q) Çewsandina Dîjîtal (Cyberbullying):**

1- Qedexe ye ku çêkerê naverokê, bi awayekî rasterast an nerasterast, şopînerên xwe han bide da ku li dijî kesekî, saziyekê yan komekê

kampanyayên çewsandin, bêrêzî yan gefan bimeşînin; her wiha nabe wan pal bide ku wêneyên rûmetşikên an naverokên ku gefê li kesekî dixwin, parve bikin.

2- Divê ji binavkirina rasterast a kesan an jî nîşandana her nîşaneyeke nasnameyî ya ku ji bo tinazkirin, biçûkxistin û sivikatîkirinê tê bikaranîn, dûr bisekine.

3- Nabe şîroveyên rûmetşikên ên şopîneran yên li dijî kesekî diyarkirî, werin nîşandan, her wiha nabe van şîroveyan bike mijara kenê yan jî şopîneran ji bo berdewamiya wan han bide.

4- Heke çêkerê naverokê bibîne ku şopînerên wî dest bi çewsandina kesê ku navê wî aniye kirine, li gorî berpirsiyariya exlaqî divê:

**a)** Bi awayekî aşkere banga rawestandina êrîşên dîjîtal bike.
**b)** Zelal bike ku rexnekirin nabe hinceta sivikatî û gefan.
**c)** Hemû şîroveyên ku gef, nefret an çewsandinê dihewînin, jê bibe.

**Pêncem: Birêvebirina Nakokî û Kêşeyan:**

1- Dema ku bi kesekî an aliyekî re nakokiyek çêbibe, divê rexne bi awayekî birêz, rast û bi belge be; bêyî ku were reşkirin, dijûn jê re were gotin an agahiyên wî yên taybet werin weşandin. Di rexnekirinê de divê giranî bê dayîn ser van xalan:

1. Rexne divê tenê li ser kiryar, bîroke yan naverokê; ne li ser regez, ol, herêm an malbata kesê beranber.
2. Dûrketina ji pênaseyên kesane yên rûmetşikên, eger nakokî çi qas dijwar be jî.
3. Bêyî delîlên aşkere, nabe mirov li ser niyetên kesan hikum bike yan jî tohmetên exlaqî yên giştgîr li wan bike.

2- Qedexe ye ku torên civakî bi awayekî neyînî werin bikaranîn; wek weşandina agahiyên hestiyar an paldana şopîneran da ku zirara madî yan manewî bigihînin kesekî.

**Şeşem: Sînorên Henekan:**

1- Henek û ken rewa ne, lê gava ku bibe sedema biçûkxistina komeke civakî, gava qalibên rûmetşikên li ser civakê ferz bike, an jî gava di bin navê qerf û henekan de gotara kîndariyê, çewsandin û handana bo xerabiyê were kirin, wê demê rewebûna xwe winda dike.

2- Divê çêkerê naverokê hişyar be ku henek û qerfên wî di paşerojê de nebin hincet an bingeh ji bo rewakirina tundûtûjî yan jî dûrxistina ti kes an aliyekî.

**Pisporiya di Naverokê de:**

1. Ji bo zêdekirina dîtin û tevlîbûna şopîneran, bikaranîna sernavên xapînok an parvekirina agahiyên derew qedexe ye.
2. Heke naverok îdiayên bijîşkî, tenduristî, yasayî yan darayî bihewîne, divê çêkerê naverokê li gorî qada pisporiya xwe tevbigere û nekeve qadên ku ne pisporê wan e.
3. Heke bixwaze di qadeke derveyî pisporiya xwe de naverokekê amade bike, divê çavkanî bi awayekî zelal were nîşandan û lînka çavkaniya resen a pisporî were danîn; her wiha piştî piştrastkirina rastiya agahiyan, nabe ti guhertin an lêzêdekirin di naverokê de were kirin.
4. Nabe şîretên pisporî wekî şûngira nêrîna pisporên wê qadê werin pêşkêşkirin, an jî cemawer were paldan ku li şûna pisporan guh bide çêkerê naverokê yê ne-pispor.

5. Weşandina agahiyên li ser mijarên bijîşkî, dermanên giyayî û bijîşkiya alternatîf ji aliyê kesên ku ne pisporê wê qadê ne, qedexe ye.

**Heftem: Naveroka Biqazanç û Şefafiyeta Reklamê:**

1. Mebest ji naveroka biqazanç; her naverokek e ku çêkerê naverokê berjewendiyeke madî an manewî ya rasterast an nerasterast jê werdigire; wekî reklam, sponsorî, marketing an handana ji bo berhem û xizmetguzariyan...
2. Reklam ji bo çêkerên naverokê rewa ne, bi şertê ku berjewendiya kesane nekeve pêşiya berjewendiya cemawer û ne li ser hesabê bawerî û şefafiyetê be. Divê bi zelalî were diyarkirin ku ew naverok reklam e yan ji bo qazancê ye.
3. Di dema weşandina reklamê de, divê çêkerê naverokê pabendî van xalan be:

   **a)** Nabe sozên ne-realîst an qazancên madî û manewî yên xeyalî bide.

   **b)** Nabe agahiyên bingehîn ên ku dibe ku zirarê bigihînin cemawer, veşêre.

   **c)** Divê agahiyên piştrastkirî, rast û ezmûnkirî bide.

   **d)** Nabe peyamên xapînok derbas bike; mîna girêdana berhemê bi nirxên exlaqî yên zêdekirî.

4. Handan an weşandina li ser berhem û xizmetguzariyên ku dibe sedema ziyanên tenduristî, derûnî an aborî ya aşkere, qedexe ye; wekî:

   **a)** Derman û zêdekerên xurekê (supplement) ku çavkaniya wan ne diyar e yan bêdestûr in.

   **b)** Bernameyên perwerdeyê yên xeternak ku ne di bin çavdêriya pisporan de ne.

**c)** Şîrketên xeyalî, veberhênanên sexte yan texmînên metirsîdar.

**d)** Her çalakiyek ku bingeha wê qumar e.

**e)** Madeyên hişber, tiştên ku yasayî qedexe ne, yan rêbazên xapandina yasayê.

**h)** Sepan (apps) û platformên biguman ên ku soza dewlemendbûna bilez yan veberhênanên xeyalî didin.

5. Di dema danasîna xizmetguzariyên ku di cewherê xwe de metirsîdar in (wek veberhênan, bazirganiya borseyê, deyn û hwd.), çêkerê naverokê pabend e ku: metirsiyan bi zelalî destnîşan bike û ji armanckirina komên herî lawaz (wek deyndar, bêkar, nûciwanan) dûr bikeve.

6. Nabe çêkerê naverokê baweriya şopînerên xwe ji bo berhevkirina bexşînan an veguhestina pereyan bikar bîne; bêyî ku şefafiyet di armana bexşînê, kesê sûdwergirtî û mekanîzmayên şopandinê de nebe.

7. Çêkerê naverokê nabe baweriya şopînerên xwe bikar bîne, da ku wan ber bi bexşîn (alîkarî) yan veguhastina pereyan ve han bide, bêyî ku armanca alîkariyê, kesê sûdwergirtî û mekanîzmayên şopandinê bi awayekî zelal û ron diyar bike.

8. Nabe rewşa hejaran, nexweşan û kesên bêparastin di bin navê "ronîkirina li ser azarên wan" de, ji bo bidestxistina navûdeng an zêdekirina dîtina naverokê were bikaranîn.

**Heştem: Berpirsiyariya di Dema Şaşîtiyan de**

1. Gava di naverokeke weşandî de şaşîtiye çêbibe (çi bi zanebûn çi jî bêhemdî be) ku li dijî xalên vê rêziknameyê be, çêkerê naverokê neçar e ku:
    **1.** Naverokê tavilê jê bibe yan jî sererast bike.
    **2.** Daxuyaniyeke zelalkirinê û lêborînxwestinê biweşîne.
    **3.** Ji bo rêgirtina li dubarebûna şaşîtiyê, pîvanên nû ji bo edîtoriyê, riyeke rêveberiya komentan û weşanên zindî deyne.

2. Lêborînxwestin û zelalkirin, rûmeta weşanger kêm nake, lê belê erkekî pîşeyî û nîşaneya gihîştin û berpirsiyariyê ye. Ev rêzikname handanê ji bo çanda pejirandina şaşîtiyan û fêrbûna ji wan dide.

**Nehem: Mafên Çêkerê Naverokê**

Li hemberî pabendbûna bi van rûmetan, çêkerê naverokê xwedî van mafan e:

1. Mafê wî heye ku ji ber nîşandana nêrîneke rêzdar ku handana ji bo nefret û tundûtûjiyê nade, neyê astengkirin an darizandin.
2. Mafê wî yê parastinê li dijî kampanyayên reşkirin û çewsandina rêkxistinkirî heye; her wiha divê mekanîzmayên gilîkirin û lêpirsînê li cem platforman yan saziyên fermî û sivîl hebin.
3. Mafê wî heye ku bigihîje bernameyên perwerdehiyê, da ku naveroka xwe pêş bixe, hînî rewiştên dîjîtal û rêveberiya guşarên derûnî bibe.
4. Mafê wî heye ku sedemên sînordarkirin an astengkirina naveroka xwe bi awayekî şefaf ji platforman zanibe û bi rêbazeke zelal îtiraz (gilî) bike.
5. Mafê alîgirî û piştgiriya ji aliyê saziyên pêwendîdar û çêkerên din ên naverokê ve heye.

6. Mafê tevlîbûna di yane, sendîka û komelên pîşeyî de heye yên ku kar ji bo birêkxistina sektora berhemanîna naverokê dikin.
7. Mafê sûdwergirtina ji diyarî (minhe), xelat û vexwendinên ku ji bo çêkerên naverokê tên pêşkêşkirin, heye.